JAG VILL VETA

## ŽELIM ZNATI

# KAKO DOLAZI DO SUDSKOG POSTUPKA


www.jagvillveta.se


© Daîreya piştgirîkirina qurbaniyên sûcan 2014
Wêne Maria Wall
Çêkirin Plakat
Åströms Tryckeri AB, Umeå 2014

# NAVEROK


**DADGEHKIRIN ÇI YE?** 6
**RÊYA KU DIÇE DADGEHKIRINÊ** 7
DIVÊ MIROV BEŞDARÎ DADGEHKIRINÊ BIBE? 8
KÎ DI DADGEHKIRINÊ DE HAZIR IN? 9
HER KÎ BIXWAZE DIKARE LI DADGEHKIRINÊ GUHDARÎ BIKE? 11
EGER MIROV JI KESÊ/A GUMANJÊKIRÎ BITIRSE 11
**TEZMÎNAT** 12
**DESTEK Û ALÎKARIYA DI DEMA DADGEHKIRINÊ DE** 14
ALÎKARÊ ŞAHID 14
KESÊ/A PIŞTGIR 14
WEKÎLÊ/A GILÎKER 15
JI BO ZAROKAN NÛNERÊN TAYBET 15
**DI DADGEHKIRINÊ DE KÎ LI KÛ RÛDINE?** 16
**DADGEHKIRIN ÇAWA DIMEŞE?** 18
DADGEHKIRIN DEST PÊ DIKE 19
ÎFADEGIRTINA GILÎKER 20
MIROV SOZ DIDE KU RAST BIAXIVE 22
KURTGOTIN 25
TEZMÎNATA JI BO MESREFÊN DADGEHKIRINÊ 25
**DADGEHKIRIN XELAS DIBE** 26
EGER BIRYAR BI DEST XWE RE WERE RAGIHANDIN 26
EGER BIRYAR PIŞTRE WERE RAGIHANDIN 27
BIRYARA NIVISKÎ 27
**PIŞTRE ÇI DIBE?** 28
**AGAHIYA ZÊDETIR?** 29







# ÇIMA EV BROŞUR HATIYE AMADE KIRIN?

Dibe ku kesên ji bo dadgehkirinê bang li wan tê kirin xwe dilbitirs û nearam his bikin – belkî ev cara pêşîn be ku mirov li dadgehê ye. Ji ber vê yekê eger mirov zanibe ka berî dadgehkirinê, di dema dadgehkirinê û piştî dadgehkirinê çi dibe mirov dikare xwe rehettir his bike.

Di vê broşurê de agahiyên li ser qonaxa dadgehkirinê têne dan, da ji kesên ku dê biçine dadgehê re bibe destekeke agahiyê. Broşur beşên cuda yên mehkemeyê salox dide û di broşurê de tê diyar kirin ka kesên li dadgehê dê çawa tevbigerin.

Agahiya zêdetir a li ser qonaxa dadgehkirinê li ser malpera www.rattegangsskolan.se heye. Di malperê de mirov dikare li vîdeoyekî binihêre ku dadgehkirinekê nişan dide û guhdarî li kesên cuda yên ku li dadgehê kar dikin bike ka wezîfeya wan çi ye.

Dibe ku kesên bi sûcan ango bi tawanan re rûbirû dimînin bikevine rewşên xerab de. Agahiya li ser desteka di rewşên wiha de û agahiya mafên zarokan li ser malpera **www.jagvillveta.se** heye.

### KESÊ/A GUMANJÊKIRÎ
Kesên ku gumana sûcekî ango tawanekî jê tê kirin weke gumanjêkirî têne bi nav kirin.

### KESÊ/A GUMANJÊKIRÎ
Dadgeh biryarê dide eger kesê gumanjêkirî dê ji ber sûcî were dadgehkirin an na.

### DAREZANDIN
Peyveke din e ku ji bo dadgehkirinê tê bi kar anîn.



# DADGEHKIRIN ÇI YE?

Dadgehkirin an jî darezandin civîna dadgehê ye û li wir biryar tê dan eger kesê gumanjêkirî dê were ceza kirin an na. Ji vê re wiha tê gotin ’dadgeh dozê diceribîne’. Eger dadgeh bigihîje wê baweriyê ku kesê/a gumanjêkirî sûcdar ango tawanbar e, wê demê biryarê dide ka ew kes dê çi cezayî bistîne.

Li Swêdê li gorî dereceyên xwe sê dadgeh hene ku hikum li ser dozan didin ango li ser sûcan hûr dibin:

**dadgeha destpêkê**
**dadgeha temyîzê**
**Dadgeha bilind**

Ev broşur li ser dadgehkirina li dadgeha destpêkê ye. Dadgeha destpêkê dadgeha pêşîn e ku li ser sûcekî hûr dibe. Tenê dema mirov bixwaze biryara dadgeha destpêkê temyîz bike, mirov dikare li dadgeha temyîzê û li Dadgeha bilind were dadgehkirin.
Navê dadgehkirinê yê din darezandin e. Dadgeh bang li kesên weke şahid û qurbaniyan dike ku têkiliya wan bi dozê re heye û dixwaze ku ew ê li dadgehê bûyera ku lê tê hûr bûn salox bidin.

# RÊYA KU DIÇE DADGEHKIRINÊ

Kesên ku bi sûcekî re rûbirû maye, ango gilîker, an jî kesên ku şahidiya sûcekî kirine ji aliyê dadgehê ve tene vexwendin. Wê demê dadgeh nameyeke gazîkirinê ango mektûbeke gazîkirinê dişîne mala van kesan. Di nameye de dinivîse ku divê ev kes biçine dadgehê. Hemû kesên ku bang li wan tê kirin divê tiştên ku di derbarê sûc de dizanin ji dadgeha dest-pêkê re bêjin.

Berî ku dadgehkirin dest pê bike, polîs lêkolînekê çê dike. Dema ku sûc li hemberî zarokekê hatibe kirin, wê demê pêşlêkolîn tim ji aliyê dozgerekî/ê ve tê meşandin. Di maweya pêşlêkolînê de polis an jî dozger kesê/a gumanjêkirî didine ber pirsan ango îfadeya wî/ê digirin. Gelek caran polis kesên din ên ku li ser sûcê xwediyê agahiyan in jî dide ber pir-san, bo mînak gilîker an jî şahidên ku pêkha-tina sûc dîtine an jî bihîstine.

Dema ku pêşlêkolîn xelas bû dozger biryarê dide eger kesê/a gumanjêkirî dê li dadgehê were darezandin an na. Eger dozger bigihîje wê baweriyê ku ji bo cezakirinê delîlên têrker hene, wê demê li dijî kesê/a gumanjêkirî dozê vedike. Ev tê wê wateyê ku êdî dadgehkirinek dê dest pê bike.

### GILÎKER
Kesê/a ku bûye qurbaniyê/a sûcekî ji aliyê dadgehê ve weke gilîker tê bi nav kirin.

### PÊŞLÊKOLÎN
Lêkolîna polîs a li ser bûyera sûcî ye.

### DOZ
Daxwaza dozger a li ser dadge-hkirina kesê/a gumanjêkirî ye.

### DOZGER
Dozger ê îsbat bike ku kesê/a gumanjêkirî sûc pêk aniye. Doz-ger sûc pêşkeş dike û delîlên li ser sûc nîşanî dadgehê dike.

## DIVÊ MIROV BEŞDARÎ DADGEHKIRINÊ BIBE?

Divê kesên ku gazînameya dadgehê distî-nin beşdarî dadgehkirinê bibin. Ev beşdarbûn girîng e, ji ber ku ji bo dadgeha destpêkê biryarekê bide divê hemû agahiyên li ser bûyerê werine bihîstin. Eger mirov nexweş bikeve an jî nikaribe beşdarî dadgehkirinê bibe, divê mirov berî ku bibe dereng dadgehê ji rewşê agahdar bike. Wê demê dadgeha destpêkê biryarê dide eger sedema nehatinê tê qebûl kirin an an.

Eger mirov bêyî ku dadgehê ji rewşê agahdar bike beşdarî dadgehkirinê nebe, wê demê heye ku mirov cezayê pereyî bide. Meblaxa pereyan ku divê were dan di gazînameya dadgehê de dinivîse. Dema ku mirov sedema nehatina xwe berî dadgehkirinê ji dadgehê re bêje û dadgeh sedemê qebûl neke, lê mirov dîsa jî beşdarî dadgehkirinê nebe, wê demê divê heman cezayê pereyî were dan. Eger mirov neçe dadgehkirinê heye ku polîs bi zorê yekî/ê bibe dadgehkirinê.

Hejmara telefonê ya dadgeha destpêkê li ser gazînameyan û di malpera **www.domstol.se** de dinivîse.

## KÎ DI DADGEHKIRINÊ DE HAZIR IN?

Di dema dadgehkirinê de çend wezîfedar li odeyê hazir in. Pirê caran kesên di odeya dadgehkirinê de ev in:

**dadger û endamên desteya dadgehê**
**nivîsvanê dadgehê**
**dozger**
**gilîker**
**kesê/a gumanjêkirî**

Gilêker carinan ji wekîlê xwe (wekîlê gilîker) destekê distîne û kesê/a gumanjêkirî jî pirê caran xwediyê parêzerekî ye ku alîkariya wî/ê dike. Herwiha şahid û ku lazim be pispor û tercûman jî di dadgehkirinê de hazir in. Kesên gilîker û gumanjêkirî di dadgehkirinê de weke alî têne bi nav kirin.

### DADGER Û ENDAMÊN DESTEYA DADGEHÊ BIRYARÊ DIDIN

Pirê caran çar dadger di dadgehkirinê de hazir in: dadgerê hiqûqzan ku weke serokê dadgehê ye û sê endamên desteya dadgehê. Serokê dadgehê dadgehkirinê bi rê ve dibe û nîzama salonê diparêze. Di dema dadgehkirinê de endamên desteya dadgehê tenê guhdarî dikin, di dawiya dadgehkirinê de ew û dadger tev de biryarê didin ka kesê gumanjêkirî dê ceza bistîne an na. Carinan jî serokê dadgehê bi tenê biryarê dide.

### NIVÎSVANÊ DADGEHÊ BÛYERÊN DI ODEYA DADGEHKIRINÊ DE DINIVÎSE

Nivîsvanê dadgehê hemû axaftinên dadgehkirinê dinivîse û li techîzata ku îfadegirtinê qeyd dike miqate dibe.

## DIVÊ DOZGER ÎSPAT BIKE KU KESÊ /A GUMANJÊKIRÎ SÛC PÊK ANIYE

Wezifeya dazger îsbatkirina sûcdariya kesê/a gumanjêkirî ye. Dozger herhiwa sûca ku hatiye kirin salox dide û delîlan peşkeş dike.

## GILÎKER KESÊ/A KU BÛYE QURBANIYA SÛC E

Kesê ku bi sûc re rûbirû maye weke gilîker tê bi nav kirin.

## GUMANJÊKIRÎ KESÊ/A KU GUMANA SÛC JÊ TÊ KIRIN E

Kesê ku guman jê tê kirin ku sûcek pêk aniye weke gumanjêkirî tê bi nav kirin.

## WEKÎLÊ/A GILÎKER ALÎKARIYA WÎ/Ê DIKE

Kesên ku bi sûcekî mezin re rûbirû mane dikarin alîkariyê ji kesêkî hiqûqzan bistînin ku weke wekîlê/a gilîker tê bi nav kirin.

## PARÊZER ALÎKARIYA KESÊ/A GUMANJÊKIRÎ DIKE

Kesê/a gumanjêkirî dikare alîkariyê ji parêzerekî bistîne, ev parêzer tiştên ku bûne bi çavên kesê/a gumanjêkirî diyar dike. Ev kes weke avûkatê parastinê(försvarsadvokat) an jî tenê weke parêzer(försvarare) tê bi nav kirin.

## DIBE KU HIN KESÊN DIN JÎ LI ODEYA DADGEHKIRINÊ HAZIR BIN

Carinan hin kesên din jî li odeya dadgehkirinê hene ku bi gotinên xwe alîkariyê dikin da ku bûyer bi awayekî zelal were teswîr kirin. Ev kes dibe ku şahidek be ku bûyerên sûcî dîtine an jî bihîstine. Wê demê divê şahid hemû tiştên ku dîtine an bihîstine ji dadgehê re diyar bike. Divê ew herwiha pirsên dozger û parêzer jî bibersivîne.

Carinan hin pispor jî li salona dadgehkirinê hazir in. Ev kes di mijarên cuda de zana ne.

Ev pispor dikare bo mînak doktor be û li ser birînên cuda yên qurbanî biaxive. Eger hin li salona dadgehkirinê nikaribin bi swêdî biaxivin wê demê wergêrek ango tercimanek jî hazir e.

## HER KÎ BIXWAZE DIKARE LI DADGEHKIRINÊ GUHDARÎ BIKE?

Pirê caran dadgehkirin ji bo herkesî vekirî ye. Ev tê wê wateyê ku her kî bixwaze dikare were û li dadgehkirinê guhdarî bike. Eger di dadgehkirinê de li ser bûyerên hesas were axaftin an jî kesê/a ku îfadeya wî/ê tê girtin ji 15 salan biçûktir be dadgeha destpêkê dikare biryarê bide ku tenê hinek kes dikarin li dadgehkirinê guhdarî bikin. Di rewşên wisa de tê gotin ku dadgehkirin li pey deriyên girtî tê meşandin. Kesên ku rûdinin û li dadgehkirinê guhdarî dikin weke guhdar tene bi nav kirin.

## EGER MIROV JI KESÊ/A GUMANJÊKIRÎ BITIRSE

Eger gilîker an jî şahid ji kesê/a gumanjêkirî bitirse dikare heta dadgehkirin dest pê bike di odeyekê de bi tenê bisekine. Eger gilîker an jî şahid nikaribin li cem kesê/a gumanjêkirî bûyerên sûcê diyar bikin, dadgeha destpêkê dikare biryarê bide û kesê/a gumanjêkirî di dema îfadedanê de ji odeya dadgehkirinê derxe. Wê demê kesê/a gumanjêkirî bi rêya hoparlorê li îfadeyê guhdarî dike. Ev rewş weke guhdarîkirina ji derve(medhörning) tê bi nav kirin.

Eger mirov bitirse ku hemû tiştên bûyinî li cem kesê/a gumanjêkirî bêje divê mirov berî ku bi derengî bikeve vê yekê ji dadgehê re bêje.

### DADGEHKIRINA VEKIRÎ

Her kî bixwaze dikare were û li salonê li dadgehkirinê guhdarî bike.

### LI PEY DERIYÊN GIRTÎ

Biryar tê dan ku tenê hin kes dikarin li dadgehkirinê guhdarî bikin.

# TEZMÎNAT

Sê cureyên tezmînatê hene ku kesê/a tûşî sûcan hatibe dikare bistîne:

**tezmînata zerardanê**
**tezmînata sîgorteyê**
**tezmînata zerardana sûcî**

Di vî beşî de agahî li ser cûreyên tezmînatê têne dan û tê diyar kirin ka kî van tezmînatan dide

## TEZMÎNATA ZERARDANÊ

Kesê/a ku tûşî sûc hatibe ango gilîker dikare tezmînata zerardanê bistîne. Tezmînata zerardanê pereyê ku kesê/a cezakirî dide gilîker e. Ji bo gilîker karibe tezmînata zerardanê bistîne divê ew di dadgehkirinê de vê yekê diyar bike. Dozger ji gilîker re dibêje ka ew dikare çiqas pereyî bixwaze. Eger gilîker doza tezmînatê bike dozger dê vê yekê ji dadgehê re diyar bike. Eger wekîlê/a gilîker hebe wê demê kesê ku daxwaza tezmînatê radigihîne wekîlê/a gilîker e.

## KRONOFOGDEN DIKARE JI BO STANDINA TEZMÎNATA ZERARDANÊ ALÎKARIYÊ BIKE

Dema dadgeh kesê/a gumanjêkirî bi tezmînatê ceza dike kopiyeya biryarê ji Kronofogden re dişîne. Dema Kronofogden vê biryarê werdigire, bi nameyekê bi gilîker re têkiliyê dideyne. Ew dipirsin eger gilîker ji bo standina tezmînatê alîkariyê dixwaze an na. Eger mirov alîkariyê bixwaze mirov formekî dadigire û ji Kronofogden re dişîne. Wê demê Kronofogden dinihêre ka kesê/a cezakirî dikare van pereyan bide an na. Eger ew karibe pereyan bide Kronofogden miqate dibe da ku pere werine dan. Divê mirov

alîkariya Kronofogden red neke da ku karibe ji Daîreya piştgirîkirina qurbaniyên sûcan tezmînata zerardana sûcî bistîne.

Ji xeynî hin rewşên pir taybet, alîkariya Kronofogden bi temamî bêpere ye. Eger Kronofogden têkiliyê bi yekî re nedeyne divê mirov bi xwe li wan bigere. Hejmara Kronofogdenê ya telefonê **077173 73 00** e.

## TEZMÎNATA SÎGORTEYÊ

Eger kesê/a cezakirî nikaribe pereyê tezmînata zerardanê bide, gilîker dikare van pereyan ji sîgorteyekî bistîne. Ev weke tezmînata sîgorteyê tê bi nav kirin. Kesê gilîker dikare ji bo tezmînkirina pereyan serî li şirketa xwe ya sîgorteyê bide.

## TEZMÎNATA ZERARDANA SÛCÎ

Eger kesê/a cezakirî nikaribe pereyên tezmînata zerardanê bide û eger ji bo tezmînê şirketeke sîgorteyê jî nebe, wê demê di hin rewşan de dewlet dikare pereyên tezmînatê bide. Ev weke tezmînata zerardana sûcî tê bi bi nav kirin. Gilîker dikare ji bo standina tezmînata zerardana sûcî serî li Daîreya piştgirîkirina qurbaniyên sûcan/Brottsoffermyndigheten bide.

Agahiya zêdetir li ser malpera **www.brottsoffermyndigheten.se** heye.

## ALÎKARÊ ŞAHID

Kesê/a ku pirsên li ser dadgehkirinê dibersivîne û qonaxa dadgehkirinê ji şahid û qurbanî re salox dide weke alîkarê şahid tê bi nav kirin.



# DESTEK Û ALÎKARIYA DI DEMA DADGEHKIRINÊ DE

## ALÎKARÊ ŞAHID

Kesê/a şahid an jî qurbaniyê/a sûcan dikare alîkariyê ji kesekî/e zana bistîne ku dikare pirsan bibersivîne û qonaxa dadgehkirinê salox bide. Ev kes herwiha cihê dadgeha destpêkê nîşanî şahid û qurbanî dike. Ev kesên ku weke alîkar kar dikin perwerdehiya vî karî dîtine û ji ber vê jî ji aliyê alîkarîkirinê ve pir baş in. Alîkarên şahidan sûnda nivîskî ya bêdengmanê dane. Ango wan sûnd xwariye ku ew gotinên şahid û qurbaniyan ji kesî re nabêjin. Alîkarê şahid dikare gelek pirsan bibersivîne û dikare salox bide ka dadgehkirin ê çawa bimeşe. Lê ew nikarin bêjin ka gilîker û şahid di dema dadgehkirinê de karin çi bêjin û çi nebêjin.

Pirê caran li dadgehên destpêkê ji bo şahid û gilîkeran odeyeke rawestanê heye. Ev ode weke odeyên alîkariya şahidan tene bi nav kirin. Mirov bêyî ku kesên din ên ku beşdarî dadgehkirinê dibin bibîne dikare li van odeyan rûne.

## KESÊ/A PIŞTGIR

Gilîker dikare kesekî/a ku nas dike bi xwe re bibe dadgehê, ev dikare kesek ji malbatê be an jî hevalekî piştgir be. Ev kes weke kesê/a piştgir tê bi nav kirin. Dibe ku mirov xwe bi desteka kesekî/a nas rehettir û ewletir his bike. Kesê/a piştgir herwiha dikare kesek ji xizmeta sosyal an jî ji rêxistineke îdeel be.
Kesê/a piştgir nikare di dadgehkirinê de biaxive, ew tenê dikare ji bo gilîker weke destekê li

wir hazir be. Kesê/a piştgir ji bo vî karî pereyan nastîne.

## WEKÎLÊ/A GILÎKER

Di hin cûreyên sûcan de mafê kesê/a gilîker heye ku alîkariya hiqûqî bistîne. Ev sûc bo mînak weke sûcên cinsî û lêdanê ne. Ev kesê ku alîkariyê dike weke wekîlê/a gilîker tê bi nav kirin. Wezîfeya wekîlê/a gilîker ew e ku di pêşlêkolîna polîs û di dadgehkirinê de destekê bide gilîker.

Pirê caran wekîlê/a gilîker avûkatek e û alîkariyê bê pere dike. Mirov dikare dema polîs dest bi lêkolîna sûc kir û pê de daxwaza wekîlekî/ê bike. Kesên ku wekîlê/a gilîker bixwazin divê vê ji polîs, dozger an jî ji dadgehê re bêjin.

## JI BO ZAROKAN NÛNERÊN TAYBET

Zarokên ji 18 salî biçûktir dikarin di dema dadgehkirinê de alîkariya taybet bistînin, pêdiviya zarokan ji xwe pirê caran bi alîkariyeke wiha heye. Kesê/a ku alîkariya zarok dike wekîlê/a gilîker e. Eger yek ji weliyên zarokan(pirê caran dê an bav e) gumanjêkirî be, an jî eger kesê/a gumanjêkirî gelekî nêzîkî welî be, wê demê zarok dikare alîkariya nûnerekî/a taybet bistîne. Ev nûnerê/a taybet di dema pêşlêkolînê de ji aliyê mafî ve alîkariya zarokê dike. Bo mînak nûnerê/a taybet dikarê biryarê bide ka zarok ê ji aliyê doktorekî ve were miayene kirin an na. An jî zarokê dibe îfadedanê. Nûner herwiha dikare di dadgehkirinê de ji bo zarok daxwaza tezmînatê bike.


Kesê/a nûner dikare avûkatek, hiqûqzanek an jî kesekî/a zana û bitecrûbe be.

## ZAROK

Kesên ji 18 salî biçûktir weke zarok têne dîtin.

## WELIYÊ ZAROKÊ

Kesek an jî kesên ku biryarê li ser zarokê didin, ango kesên ku ji aliyê hiqûqî ve berpirsên zarokê bin weke weliyê zarokê têne bi nav kirin. Pirê caran an yek ji dê û bavê zarokê an jî hem dê û hem jî bav weliyê zarokê ne.






# DI DADGEHKIRINÊ DE KÎ LI KÛ RÛDINE?

Većina sudnica su nalik jedna drugoj i učesnici uvjek sjede na istim mjestima. Ova slika pokazuje gdje ko sjedi u sudnici i kako su obično raspoređeni namještaj i tehnička oprema.

# SALONA DADGEHKIRINÊ



## DAREZANDIN

Dadgehkirin herwiha weke darezandinê tê bi nav kirin.

## ALÎGIRÎ

Hin caran rîsk heye ku dozger an jî dadger alîgiriyê bikin. Bo mînak dibe ku ew hin kesên di dadgehkirinê de nas dikin û ji ber vê jî alîgiriya wan dikin. Ev rewşê weke alîgirî tê bi nav kirin.



# DADGEHKIRIN ÇAWA DIMEŞE?

Li vir tê diyar kirin ka ji dema mirov tê dadgeha destpêkê û heta dadgehkirin xelas dibe, dadgehkirinek çawa tê meşandin.

### DEMA MIROV TÊ DADGEHA DESTPÊKÊ

Dema mirov tê dadgeha destpêkê li ber dergeh dinivîse ka dadgehkirin ê li kîjan salonê pêk were. Pêwîst nake ku mirov xwe qeyd bike. Mirov dikare li odeya rawestanê rûne heta ku di hoparloran de destpêkirina dadgehkirinê were îlan kirin. Carina şahid berî destpêkirina dadgehkirinê têne dadgehê. Di gazînameyê de dinivîse ka divê şahid kengî werine dadgehê.

Dema dadgehkirin dest pê dike, serokê dadgehê kontrol dike ka hemû kesên ku divê li wir bin hazir in an an. Carinan îfadegirtina dadgehê bi rêya telefon û vîdeolînkê tê meşandin. Wê demê hazirbûna kesên ku bi vê rêyê îfadeya wan tê girtin pêwîst nake. Eger îfadeya yekî bi rêya telefon an jî vîdeolînkê were girtin ev yek di gazînameyê de tê nivîsandin.

Dema herkes hazir dibe, serokê dadgehê dipirse eger astengiyên li dijî destpêkirina dadgehkirinê hene an na. Pirê caran tu astengî nînin.

### DADGEHKIRIN DIKARE WERE BETAL KIRIN?

Eger hin kes neyêne dadgehkirinê, dadgehkirin dikare were betal kirin. Eger dadgehkirin were betal kirin rojeke din dadgehkirineke din tê li dar xistin û ev bi gazînameyekê tê ragihandin. Dema rîska alîgiriyê hebe dîsa dadgehkirin tê betal kirin.

## DADGEHKIRIN DEST PÊ DIKE

Dema ku dadgehkirin dest pê dike serokê dadgehê ji dozger daxwaza xwendina serîlêdana dozê dike ku ji bo dadgehê hatiye şandin. Dozger piştî xwendinê daxwaz dike ku kesê gumanjêkirî dê ji ber sûcên diyarkirî were cezakirin. Eger gilîker daxwaza tezmînatê bike, dozger, wekîlê/a gilêker an jî gilîker bi xwe vê diyar dike û meblaxa daxwazkirî dibêje.

Piştre serokê dadgehê dipirse eger kesê gumanjêkirî sûcî qebûl dike an înkar dike. Serokê dadgehê herwiha dipirse eger kesê/a gumanjêkirî bi tezmînatê were ceza kirin ew ê karibe vê tezmînatê bide an na. Ev rewş weke qebûlkirin an jî redkirina berpirsiyariya tezmînetê tê bi nav kirin. Serok herwiha dipirse eger kesê/a gumanjêkirî dixwaze tiştekî li ser meblaxa tezmînatê ya ku hatiya daxwazkirin bêje an na.

Piştî vê dozger encama pêşlêkolînê dixwîne. Ango dozger sûcê salox dide û fikra xwe ya li ser vê yekê diyar dike. Dozger herwiha delîlên sûcî pêşkeş dike. Carina dozger delîlên nivîskî dixwîne, bo mînak weke raporên doktor ku birîn û zeraran diyar dikin. Piştî pêşkeşkirina dozger parêzer gotinên dozger şîrove dike.

### SÊRÎLÊDANA DOZÊ

Serîlêdana dozê, saloxdanên sûcî yên nivîskî ne ku li gorî dozger divê kesê/a ku ev kirine were ceza kirin.

### DAXWAZKIRIN

Daxwazên xwe diyarkirin.

### REDKIRIN

Protestokirin an jî li dijî rabûn.

### PÊŞKEŞKIRINA SÛCÎ

Dozger bi awayekî hûr bûyera sûcî diyar dike û fikra xwe ya li ser vê dibêje.

## ÎFADEGIRTINA GILÎKER

Vêga dema îfadegirtina gilîker e. Gilîker ê bêje ka çi bûye û tûşî çi sûcî hatiye. Di dema îfadegirtinê de gilîker li cihê xwe yê di rex dozger de rûdine.  Îfadegirtin hem bi deng hem jî bi vîdeo tê qeyd kirin, lê tiştên ku têne qeyd kirin tucaran li derveyî dadgehê nayêne nîşan dan.

### DIBE KU ÎFADEDAN ZEHMET BE

Îfadegirtina gilîker gelekî bi hûrgilî tê meşandin. Ev girîng e, ji ber ku divê dozger hertiştî zanibe, da ku karibe îsbat bike ku bûyera pêk hatiye sûc e. Serokê/a dadgehê hay jê heye da ku dozger, parêzer an jî wekîlê/a gilîker tenê pirsên di derbarê sûcî de bipirsin. Eger kesê ku îfadeyê dide bersiva pirsekê nizanibe, eger ne emîn be an jî eger nexwaze pirsê bibersivîne wê deme dikare vê yeke ji serokê/a dadgehê re bêje. Eger îfadedan gelekî zehmet be, gilîker dikare ji serokê/a dadgehê daxwaza navberekê bike.

### BERÎ KU ÎFADEGIRTIN DEST PÊ BIKE ÇI DIBE?

Gelek ji kesên ku dê îfadeyê bidin divê berî ku dest bi îfadedanê bikin sûnd bixwin. Ev tê wê wateyê ku mirov soz dide ku hemû tiştên ku bûne bêje û mirov nikare tiştekî veşêre an jî bi ser ve zêde bike. Sûndxwarina gilîker hewce nake. Berî ku îfadegirtin dest pê bike serokê dadgehê van nuqteyan diyar dike. Her çiqas ku sûndxwarina gilîker ne hewce be jî divê ew rast biaxive. Serokê dadgehê herwiha diyar dike ku îfadegirtin li ser daxwaza dozger tê çê kirin. Piştî vê dozger dest bi îfadegirtinê dike.

### DOZGER PIRSAN DIKE

Dozger dixwaze ku gilîker bi xwe dê bêje ka çi bûye û çi nebûye. Piştre dozger pirsan ji

gilîker dike. Armanca pirsên dozger bidestxistina agahiya zêdetir a li ser bûyerê ye.

### GILÎKER DIKARE NOTÊN KURT BI XWE RE BÎNE

Di dema vegotina bûyerê de gilîker dikare notên kurt ên bîranînê yên li ser bûyerê bi xwe bîne. Ev not dikarin weke peyvên alîkar an jî tarîxên girîng bin. Di dema dadgehkirinê de mirov nikare serpêhatiyê ji kaxezê bixwîne. Dadger dikarin bixwazin li notên bîranînê binihêrin da ku zanibin ku gilîker hemû serpêhatiyê ji kaxezê naxwîne.

### AVÛKATÊ PARASTINÊ JÎ PIRSAN DIKE

Avûkatê parastinê an jî kesê/a gumanjêkirî jî dikare piştre pirsan ji gilîker bike. Pirsên ku ew dikin dişibine yên dozger, lê armanca wan cuda ye. Avûkatê parastinê bi vî awayî dixwaze şike li ser sûcdariya kesê gumanjêkirî çê bike an jî nirxandina sûcî nerm bike. Ji ber vê jî belkî gilîker pirsen ku jixwe bersivandine bibihîze. Dibe ku mirov xwe ji ber vê yekê gelekî kontrolkirî his bike. Avûkatê parastinê van pirsan dike da ku detayên gotinên gilîker careke din kontrol bike.

### ÎFADEGIRTIN XELAS DIBE

Berî xelaskirina îfadegirtinê serokê/a dadgehê, wekîlê/a gilîker û dozger hin pirsên dawîn ji gilîker dikin. Dema hemû pirs têne kirin serokê/a dadgehê radigîne ku îfadegirtin xelas bûye.

**SÛNDXWARIN**
Mirov soz dide ku rast biaxive.

## MIROV SOZ DIDE KU RAST BIAXIVE

Eger gilîker nexwaze di berdewama dadgehkirinê de hazir bimîne, ew dikare vê yekê ji serokê/a dadgehê re bêje. Lê çêtir e eger mirov bimîne û bibîne ka li salona dadgehkirinê çi dibe. Dema mirov vê bike, dibe ku famkirina qerar û serpêhatiyê hesantir bibe. Carinan divê mirov bimîne da ku di dawiyê de hin pirsan bibersivîne.

Piştî îfadegirtina gilîker îfadeya hin kesên din jî dê were girtin da ku bi zelalî were dîtin ka çi bûye û ka kî ev kiriye.

### ÎFADEGIRTINA KESÊ/A GUMANJÊKIRÎ

Îfadegirtina kesê/a gumanjêkirî jî bi gelemperî weke ya gilîker derbas dibe. Ferqa wê ew e ku kesê ku dest bi îfadegirtinê dike serokê dadgehê ye û daxwaz dike ku kesê/a gumanjêkirî dê versiyona xwe ya bûyerê bibêje. Serokê dadgehê herwiha dikare hin pirsan ji kesê/a gumanjêkirî bike. Piştre dor tê dozger. Dema dozger pirsên xwe xelas dike dor tê avûkatê parastinê.

### ÎFADEGIRTINA ŞAHIDAN

Dema îfadegirtina kesê/a gumanjêkirî diqede dor tê îfadegirtina şahidên muhtemel. Şahid bi dorê têne salona dadgehkirinê û pirsan dibersivînin.

Dema şahid tê hundirê salona dadgehkirinê ew diçe cihê li ber dadger. Pêşîn sûnd tê xwarin, ango şahid soz dide ku ew ê rast biaxive. Serokê dadgehê sûndê dixwîne û şahid peyre dubare dike:

» Ez (li vir şahid navê xwe dibêje) li ser şeref û wîjdana xwe sûnd dixwim ku ez ê hemû tiştên rast bêjim, tiştekî naveşêrim û tiştekî bi ser ve zêde nakim an jî naguherim.«

Şahidiya sûndxwarî tê wê wateyê ku divê mirov rast biaxive. Ku mirov derewan bike, mirov dikare ji ber vê cezayekî bistîne ku weke sûndxwarina derewîn(mened) tê bi nav kirin. Serokê dadgehê ji şahid re girîngiya tiştên ku ew dizane û girîngiya rastgotinê diyar dike. Piştî ku sûnd hate xwarin şahid dikare rûne. Şahidbûn û xwarina sûnda şahidbûnê pirê caran mecbûrî ye. Berî ku şahid sûnd bixwe serokê dadgehê kontrol dike ka şahid û gilîker an jî kesê/a gumanjêkirî bi hev re xizm in an na. Carinan, bo mînak eger şahid zaroka kesê/a gumanjêkirî be wê demê hewce nake ku ew şahidiyê bike. Xizmên kesê/a gumanjêkirî ku dixwazin şahidiyê bikin nikarin sûnd bixwin.
Bi piranî kesê/a ku daxwaza îfadegirtina şahidan dike dozger e û ji ber vê jî ew dest bi îfadegirtinê dike. Eger daxwaza îfadegirtina şahidan ji aliyê kesê/a gumanjêkirî an jî ji aliyê avûkatê parastinê ve hatibe kirin wê demê ew dest bi îfadegirtinê dikin.

### ÎFADEGIRTINA KESÊN PISPOR

Îfadegirtina pisporan pirê caran piştî ya şahidan pêk tê.

## SÛNDXWARINA DEREWÎN

Ev tê wê wateyê ku eger mirov derewan bike mirov dikare ji ber vê ceza bistîne.

## AGAHIYÊN KESANE

Tê wê wateyê ku mirov kontrola mercên kesê/a gumanjêkirî dike, bo mînak mercên wî/ê yên ekonomîk.



### DELÎLÊN NIVÎSKÎ

Çend cureyên delîlên nivîskî hene ku dê di dema dadgehkirinê de werine nişan dan, bo mînak rapora doktor, fîşê hesabê bankê an jî name. Delîlên nivîskî an berî an jî piştî îfadegirtina şahidan têne pêşkeş kirin.

### MERCÊN KESÊ/A GUMANJÊKIRÎ YÊN KESANE

Dema ku hemû îfadegirtin hatine qedandin û hemû delîl hatine pêşkeş kirin, êdî dora kontrolkirina mercên kesê/a gumanjêkirî tê. Ev kontrolkirin li ser jiyana kesê/a gumanjêkirî ye. Ev tê kirin da ku paşî dadgeha destpêkê zanibe ka çi ceza dê were dan.

Yek ji dadgeran diyar dike ka dadgeha destpêkê çi di derheqê bingehê kesê/a gumanjêkirî de dizane. Bo mînak dadger li ser jiyana kesê/a gumanjêkirî ya dibistanê, ya kar û li ser mal û malbata wî/ê diaxive. Carinan li ser kesê/a gumanjêkirî hin miayeneyên taybet têne kirin. Ev miayene dikarin bo mînak li ser psîkolojî an jî kesayeta kesê/a gumanjêkirî be. Dadgeh li ser van miayeneyan jî diaxive. Piştre kesê/a gumanjêkirî li ser ekonomiya xwe ango li ser meaş û deynên xwe diaxive. Eger dadgeh cezayê pereyî bide ev agahî ji bo vê girîng dibin. Lê dîsa jî ji bo tezmînata zerardanê rewşa ekonomiya kesê/a gumanjêkirî pir ne girîng e.

Carinan kesên ku kesê/a gumanjêkirî baş nas dikin ên weke dê û bavê wî/ê jî li salona dadgehkirinê ne. Wê demê ew dikarin li ser rewşa kesê/a gumanjêkirî ya kesane biaxivin.

## KURTGOTIN

Di dawiyê de dadgehkirin bi kurtî tê vegotin. Pêşî dozger diaxive. Kurtgotina dozger weke axaftina dawîn tê bi nav kirin.  Dozger bi kurtî li ser sûcê kesê/a gumanjêkirî diaxive û diyar dike ka ew di emcama îfadegirtin û  nihêrîna delîlan de gihîştine çi. Dozger herwiha cezayê ku ew ji bo kesê/a gumanjêkirî dixwaze jî diyar dike, ev weke mieyîde jî tê bi nav kirin.

Wekîlê/a gilîker jî dikare nihêrînên xwe yên di derbarê tezmînatê de bi kurtî diyar bike.
Piştre avûkatê parastinê kurtgotina xwe dike. Ev dişibe ya dozger, lê ji çavên kesê/a gumanjêkirî tê vegotin.

Piştî ku kurtgotina parêzer diqede, serokê dadgehê dipirse eger kesê/a gumanjêkirî dixwaze tiştekî din bêje an na. Peyre kurtgotin xelas dibe.

## TEZMÎNATA JI BO MESREFÊN DADGEHKIRINÊ

Gilîker, kesê/a gumanjêkirî an jî şahid dikare ji bo mesrefên dadgehkirinê tezmînatê bistîne. Ev dikare bilêtên otobûsê yên ku ji bo hatin û çûna dadgehê hatine kirîn bin. Eger mirov dûrî dadgehê bijî, mirov dikare ji bo cihê razanê û xwarinê jî tezmînatê bistîne.

Tezmînat ji resepsiyona dadgehê tê wergirtin. Di gazînameya dadgehê de jî dinivîse eger mirov ji bo mesrefan tezmînatê dixwaze an na.

Di dawiya dadgehkirinê de parêzer û wekîlê/a gilîker daxwaza heqê wezîfeya xwe dikin. Wekîlê/a gilîker û nûnerê taybet ji bo qurbaniyê sûcî tim bêpere ne.

## KURTGOTIN

Dozger, parêzer û wekîlê/a gilîker bi kurtî dadgehkirinê vedibêjin.

## CEZA

Eger dadgeh biryarê bide ku kesê/a gumanjêkirî sûcdar e, wê demê li ser cezayekî li hev tê kirin. Ji vî cezayî re mieyîde(påföljd) jî tê gotin. Cezayên cuda yên weke girtîgeh, cezayê pereyî û lênêrîn û perwerdeya ciwanan hene.

## CIVÎNA BIRYARDANÊ

Dadger dicivin û danûstandineke fikrî pêk tînin da ku biryara dadgehkirinê diyar bikin.



# DADGEHKIRIN XELAS DIBE

Dema ku serokê dadgehê îlan dike dadgehkirin xelas dibe. Peyre serokê dadgehê dibêje ka kengî biryar ê were ragihandin. Biryar an bi dest xwe re tê ragihandin an jî pey dadgehkirinê re. Bêyî ku li dema ragihandina biryarê were nihêrîn dadger tim civîna biryardanê dikin.

Di civînê de dadger li ser fikr û biryarên ku wan di dema dadgehkirinê de girtine diaxivin û biryara dawîn distînin. Kesê/a gumanjêkirî an tê ceza kirin an jî ji cezayan tê azad kirin. Eger kesê/a gumanjêkirî were azad kirin, mirov dibêje doz hate red kirin.

## EGER BIRYAR BI DEST XWE RE WERE RAGIHANDIN

Carinan dadgeha destpêkê biryarê bi dest xwe re radigihîne. Wê demê serokê dadgehê dibêje civîneke taybet dê were çê kirin. Tenê dadger û hin kesên ku protokol îmza kirine dikarin di vê civînê de bimînin. Beşdarên din û guhdarê dadgehkirinê derdikevine derve û li odeya rawestanê disekinin.

Dema ku biryardana dadgeran diqede, serokê dadgehê di hoparloran de bang dikin û biryara dadgeha destpêkê eşkere dike. Eger kesê/a gumanjêkirî sûcdar be serokê dadgehê ceza û tezmînata zerardanê jî îlan dike. Piştre serokê dadgehê bi kurtî li ser civîna biryardanê disekine, ango ew diyar dike ka wan çima û çawa ev biryar daye. Di dawiyê de jî ew dibêje ka mirov çawa dikare biryarê bibe temyîzê. Dema biryar hate ragihandin dadge-

hkirin bi temamî xelas dibe û salon vala dibe. Ji xeynî îlankirina biryarê ya devkî dadger herwiha biryarê nivîskî jî radigihînin.

## EGER BIRYAR PIŞTRE WERE RAGIHANDIN

Dadgeha destpêkê dikare biryarê piştre îlan bike. Di rewşên asayî de biryar di heftiyekê an di du heftiyan de tê ragihandin û mirov dikarê wê demê telefon bike û bipirse ka dadgehê çi biryar daye.

## BIRYARA NIVISKÎ

Dadgerê serok biryarê li ser kaxezê dinivîse. Ev biryara nivîskî tim ji kesê/a gumanjêkirî û gilîker re bê pere tê şandin. Eger gilîker vê biryara nivîskî wernegire divê têkiliyê bi dadgeha destpêkê re deyne. Şahid û kesên ku dixwazin divê biryara nivîskî siparîş bikin û pereyê kopîkirinê bidin. Mirov dikare bir êya e-mailê jî siparîş bike, wê demê ev bêpere ye.

## BIRYARA DADGEHÊ

Biryara ku dadgeh li ser kesê/a gumanjêkirî distîne ye, bo mînak an kesê/a gumanjêkirî ji ber sûc tê ceza kirin an jî azad dibe.

## REDKIRINA DOZÊ

Kesê/a gumanjêkirî ji ber sûc nayê ceza kirin.



# PIŞTRE ÇI DIBE?

Gava biryara dadgehê tê îlan kirin gilîker an jî kesê/a gumanjêkirî dikarin di sê heftiyan de biryarê bibine temyîzê. Eger kes daxwaza temyîzê neke biryar nayê guhertin.

## EGER BIRYAR WERE TEMYÎZ KIRIN

Eger biryara dadgehê were temyîz kirin careke din dadgehkirin tê çê kirin. Vê carê dadgehkirin li dadgeha temyîzê tê meşandin. Pirê caran hazirbûna gilîker û kesê/a guman-jêkirî ya li dadgeha temyîzê hewce nake. Dadgeha temyîzê li şûna vê li qeydên îfade-girtinên dadgeha destpêkê guhdarî dike.


# AGAHIYA ZÊDETIR?

Postoji puno korisnih web stranica sa informacijama za vas koji želite znati više ili imate nekih pitanja.

**Više informacija o sudskom postupku naći ćete na:**
web stranici švedskih sudova **www.domstol.se**
web stranici policije **www.polisen.se**
web stranici centrale za žrtve krivičnog djela **www.boj.se**
web stranici Škole o sudskom postupku **www.rattegangsskolan.se**

**Više informacija o odšteti naći ćete na:**
web stranici Državnog organa za zaštitu prava žrtava krivičnog djela **www.brottsoffermyndigheten.se**
web stranici prinudnog izvršitelja **www.kronofogden.se**

**Više informacija o podršci i zaštiti za žrtve krivičnog djela naći ćete na:**
**www.jagvillveta.se**



# BI KURTÎ DI DERBARÊ DAÎREYA PIŞTGIRÎKIRINA QURBANIYÊN SÛCAN DE

Daîreya piştgirîkirina qurbaniyên sûcan bi awayekî neteweyî berpirsiyariya sê beşên xizmetê dike:


**Tezmînata zerardana sûcî**
**Fonda qurbaniyên sûcî**
**Navenda zanyariyê**

Armanca sereke ya daîreyê pêşvexistina mafên qurbaniyên sûcan û balkişandina ser pêwîstiyên wan e.

Li ser malpera **www.brottsoffermyndigheten.se** bi zimanên din jî agahî li ser mafên qurbaniyên sûcan û qonaxa dadgehkirinê heye. Li wir herwiha navnîşanên daîreyên din û komeleyên îdeel ên ku li ser vê mijarê hûr dibin hene.

Daîreya piştgirîkirina qurbaniyên sûcan pirsên li ser tezmînatên sûcan bi kêfxweşî dibersivîne.

Mirov dikare telefonî hejmara yekîneya zerardanê sûcî bike û bi dabeşnêrekî/ê re biaxive **090-70 82 00**.



**BROTTSOFFERMYNDIGHETEN**
(DAÎREYA PIŞTGIRÎKIRINA QURBANIYÊN SÛCÎ)
Box 470, 901 09 Umeå
Tel: 09070 82 00
registrator@brottsoffermyndigheten.se
www.brottsoffermyndigheten.se
www.rattegangsskolan.se